## Şîret û ezmûnên ku bo me dibne wane

»»» R:10





## Straneke kevin!

»»» R:3

## Mafê çarenivîsê!

»»» R:7

## Dibe em berevajî kar bikin

»»» R:9



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (441) 07-03-2023Buha (1000) Tûmen


# Peyamek dîrokî û tijî îrade

Peyama ku piştî 32 salan xebata nehênî, carek din hêz û îradeya netewî geşand û bû destpêka berxwedaniya netewa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê li hember dagîrkariya rejîma navendiya Îranê.

Destpêka peyamê tijî ji hemase rû li gelê Kurd û endam û alîgirên PDKÎ, û dost û dujminan ji zimanê rêberê mezin Dr. Qasimlo Sekertêrê Giştî yê PDKÎ ve, wiha bû: Hevwelatiyên hezkirî!

Îro Hizba Demokrat piştî derbasbûna 32 salan xebata nehênî, xebata aşkeraya xwe radigihîne.

Tenê ev risteye ji peyama dîrokî ya Qasimlo li metînga 100 Hezar kesî li bajarê Mihabadê, têra hindê hebû ku, weke starteke bikare xebateke dûr û dirêj û tijî ji fîdakarî bîne bîra xelkê Kurdistanê.

Ev peyam têra hindê hebû ku ji nû ve hesta netewayetî bê weşandin.

Têra hindê hebû ku Kurdistanê rake coşê ji bona berxwedaniya li hember egera êrîşa



dujmin bo ser Kurdistanê.

Ev peyam bû sedem ku careke din li seranserê Rojhilatê Kurdistanê bala xelkê bo aliyê bername û siyaseta neteweyî ya PDKÎ bê rakêşan û devra vê Hizbê kom bibin.

Ev peyameke tijî ji îrade û bawirî bi xwebûn û micid ya Kurd û Kurdistanê bû ku bîne bîra dujminan ku gelê Kurd ti caran li hember stem û zordarî û gef û êrîşên wan de bê deng nabe û serê xwe xwar nake û teslîm nabe.

Vê peyamê da xûya kirin ku ger di pêvajoya xebata netewayetiya Kurdan de ji bona rizgariyê renge gelek evraz û nişîv hebin, lê ti caran ev xebat nasekine û heta roja gihîştina bi armancan dê berdewam be.

Peyama metînga 11ê Reşema sala 1357an a rojî li Mihabadê bû ku da îsbatkirin ku gupka daxwazên netewa Kurd gihîştina bi mafê çarenivîsê ye û bi bê bidestve hatina vê daxwazê, gelê Kurd dê pêşengê xebatê be û ti hêz, dictator, êrîş, gef, girtin, kuştin û qirkirineke dujminan, nikare wî gelî û xebata vê bixe qedeman.

Peyama 11ê Reşemê û ragihandina xebata aşkera ya Hizba Demokrat, bi hest û îradeyeke qahîm ve, îro rojê di mejî û dilê nêzîk bi hemî xelkê welatparêz yên Rojhilatê Kurdistanê de ye, û her li ser bingeha hizrî ya vê peyamê ye ku îro rojê gelê me dîsan pêşeng e, xwedî îrad e ye û alahilgirê şoreşa Jin Jiyan Azadiyê ye û asta hişyariya netewî û xebata yekgirtiyane ya Kurd û hebûna Hizba pêşeng ya xebata netewî û xwediyê peyama metînga Mihabadê, bûye sedem ku hemî azadîxwazekî seranserî Îran û netewên din jî bi çavê hêviyê ve bera xwe bidin Kurd û Kurdistanê û xebata vê.

Îro her kes, hest bi giraniya vê peyamê li ser xebatê dike. Ev peyam bê dawiye heta serkevtina yekcarî.

# Mistefa Hicrî:“Heta wê demê ku pişt û penaha me Kurdistaniyên xweragir e û yekgirtina me çepera yekem û paşeroja xebata me ye, Kurdistan rastî tevlîheviyê nabe

**Rêzdar “Mistefa Hicrî” peyameke taybet belav kir**

**Rêzdar “Mistefa Hicrî” Berpirsê Navenda Birêveberiya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di peyamekê de bi balkişandin li ser pêwîstiya yekgirtinî û yekrêziya zêdetir a hemû Kurdistaniyan, ragihandiye, “heta wê demê ku pişt û penaha me Kurdistaniyên xweragir e û yekgirtina me çepera yekem û paşeroja xebata me ye, Kurdistan rastî tevlîheviyê nabe.**

**Deqa Peyamê wiha ye:**

**Hevnîştimaniyên hêja!**

**Kurdistaniyên xweragir!**

Rojhilatê Kurdistanê di şert û merceke hestyar de derbas dibe.

Ji aliyekê ve digel tevahiyetxwazî û dagîrkariya Komara Îslamî rû bi rû ye û ji aliyek din ve jî digel metirsiya dûbarehatina gorê ya tavahiyetxwazî û dagîrkeriya paşerojê di Îranê de rû bi rû ye.

Lewam ya ku dikare di wê rewşê de aramî û serkevtina me di paşerojê de misoger bike, tiştek nîne bilî yekgirtin, lihevtêgihîştin û bi hevnêzîkbûna xelkê Kurdistan û hêzên siyasî ye.

Ya ku heta niha ku piştî şehîdbûna Jînayê bûye sedemê vê ku civatgeh û nîştimana me bejna wê bilind be, yekgirtina Kurdistaniyan û hêzên xebatkaran bûye.

Lê ew yekgirtine bê astengî nebûye; Komara Îslamî ji aliyekê û alîgirên tevahiyetxwazî li dereve aliyek din berdewam di hewla vê de bûne ku rêz û mezinahiya wê yekgirtina Kurdistaniyan bixine jêr pirsyarê û di hewla vê de bûn ku çepera Kurdistanê bihejînin û bê hêvîtiyê bi Kurdistaniyan bibexşînin.

Cudahiya nerînan li Kurdistanê mijareke asayî ye û nîşaneyeke micid e di civatgeheke zîndî de.

Lê xala cudaker a cudahiya nerînan û pirsa nîştimana wan ev e ku divê hemû pêbendê binyatên sereke yên hêlên nîştimanî bibin.

Ew hêlananeyê ku xwe li misogerkirina asayişa nasnameyî û çarçêveya siyasî, kultûrî û civatgeha Kurdistaniyan ji Îlam û Kirmaşanê ve heta serweyê Rojhilatê de dibîne.

Me şik ne ji tevgera rizgarîxeaziya Kurdisatanê û ne ji qewareya cugrafiyaya siyasî ya Rojhilatê û ne jî li xalên bingehîn ên mafê Kurdistaniyan nîne;

Lewam hewce nake em, xwe û civatgeha xwe tûşê xemgîniyê bikin.

Çimkî me her dem amadehiya vê yekê hebûye ku ber bi qonaxekê ve pêngavan biavêjin ku tê de yekîtiyeke dilxwazî bê avakirin bo paşeroja Îranê ku tê de Kurdistan bibe xwediyê mafê xwe.

Vê naçe ti Kurdistaniyek dijî vê mafê be, lê ev şopînerên tevahiyetxwazên ku dixwazin wisa nîşan bidin ku dikarin derzê bixine nav refên yekgirtiya Kurdistaniyan.

Di dawiyê de, wekî berpirsiyarî, ez dixwazim li ser vê yekê rawestim heta wê demê ku pişt û penahê me Kurdistaniyên xweragir e û yekgirtina me çepera yekem û paşerojê ya xebata me ye, Kurdistan rastî tevlîheviyê nabe.

Çimkî hizbên wê yên siyasî emrazê siyasî ne bo maf û daxwazkariyên nîştimana xwe, ne nîştiman emrazek be bo hizban.



Lewma hewce dike tevahiya hewla me bo wê be di asta xwast û daxwazkariyên welatiyên Kurdistanî de.

Ezmûnên  Başûr, Rojava û Bakurê Kurdistanê, em hînê hin waneyên giranbuha kirine ku egere em yekgirî bin, Kurdistan dibe xwediyê pêgeh û serwerî û eger em parçe parçe bin dagîrkarî û jidestdana nîştimanê çavnihêrê me dike.

Lewam Ez daxwazê dikim:

Werin em hemû, bi taybetî endam û alîgirên hizbên siyasî, pênûs, ziman û çalakiyên xwe ji bo xurtkirina vê yekîtiyê bikar bînin, yekgirtinî hem di navxweyê Kurdistan û hem yekgirtina Kurdistanê digel beşên din ên Îranê.

Daxwazkariyek min a dinê li Kurdistaniyên hezkirî li navxwe û derveyê welat eve ye, bila em xwe ji bo newroza îsal amade bikin.

Lewam rû li Kurdistaniyên camanepoş, xortên xakîpoş, evîndarên daweta alayê, xebatkarên hemaseya Kirmaşan û di dawiyê de Kursana bawan eve ye, newroza îsal bikin bi newroza berxwedan û lihemberderkevtin bo qahîmkirina çepera yekgrtîna nîştiman.

Penah û dawî sekinîngeha aramiya me ji Kurdistanê ve ye û her Kurdistan divê bêje me hemûyan: Kes nebêje Kurd miriye, Kurd zîndî ye.

**Mistefa Hicrî**

**Berpirsê Navenda Birêveberiya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**

**16ê Reşemeya 1401`an**

**7`ê Şibata 2023`an**

# Straneke kevin!



N: Kerîm Perwîzî

Desthilata serhişk ya paşayetî nû hilweşiya bû û ew heyama çend rojan bû bi ser derbas bibû. Hîn rewşa nav gund û bajaran li rewşa kolanên piştî bager û bahozê dişbiyan ku erd tere û tiştên ku bahozê digel xwe birbûn li derdorê belav kevtibûn.

Çend rojek bû ku wezîfedarên ewlehî û jandarmirî li ser serê xelkê neman bûn, lê hîn dijber û beledî û jandarmirî û binkeyên leşkerî li chên xwe de bûn.

Li bajarê Tehran û bajarên mezin, binkeyên leşkerî û hêzên jandarimirî kevtibûn destê xelkê de û li ser navê şoreşê, çek kevtibûn destê wan, lê li Kurdistan hîn binkeyên leşkerî û binkeyên întizamî li cihê xwe de bûn. Rejîma berê di nav bajaran de jî nemabû û Sawak û desthilata sepandî nemabû, lê kesên girêdayî bi Sawakê di wê navberê de xuya dibûn ku hîn jî wirda wêrda dihatin dîtin.

Reweşke ne zelal bû ku paşeroj çi pê ye? Şoreş li dijî paşayetî serkevtibû, lê hîn paşeroj xuya nebû ka dê çawa be.

Nêzî sê hefteyan piştî hilweşîna pasayetiyê, di vê rewşa han de ku hem xelk hêviya azadiyê hebûn û hem cem wan paşeroj şêlû û nexuya bû, di nav gund û bajarên Kurdistanê de denge dengek belav bibû ku, mîtîngeke mezin li Mihabadê dê bê lidarxistin!

Xelkê ji hevdu pirs dikirin ku mîtîng bo çi tiştekê ye û çi kesek dê biaxive? Dibe bas ji çi tiştekê bê kirin? Bersiv ev bû ku Dr. Qsimlo, rêberê Hizba Demokrat dê biaxive.


Xelk kevtin tevgerê û ji bo wan bû bi pirsyar gelo Dr. Qasimlo dibe çi bêje? Her ji ber vê yekê li tev bajarên Kurdistanê û heta li hinek bajarên Îranê, cemawer ber bi cihê ragihandina Komara Kurdistanê ve meşiyan, bo beşdarîkirin di mîtînga Dr. Qasimlo de.

Roja 11`ê Reşemey(2`ê Adar) ê bi dehan hezar kesî li hemû Kurdistanê û li bajarê Mihabadê kom bibûn û çavnhêr bûn ku Dr. Qasimlo were. Dilkutika wan hebû ku gelo Dr. Qasimlo çi peyamek pê ye û paşeroja jiyana wan dibe çawa be?

Roja 11`ê Reşemey(2`ê Adar) ê di civîna bi dehan hezar mirovî ya li Mihabadê de, Dr. Qasimlo li ser navê rêberatiya Hizba Demokrat peyama berdewamî dan bi xebatê ragihand û têkoşîna eşkere ya Hizbê ji gelê Kurd, gelê Îranê û serdemdarên şoreşa dijî paşayetiyê re ragihand. Peyama Dr. Qasimlo di roja ragihandina xebata eşkereya Hizba Demokrat de piştî 32 salan xebata nehênî peyameke dîrokî bû ku manîfesta xebat û têkoşîn û vejiyana Kurdistan û Kurd ku piştî çendîn dehikan e, hîn nek naveroka peyamê belkû peyv û forma peyamê nû ye û derûna tî bûna xebatkaran têr av dike.

Baskirin û gengeşekirina li ser peyama rêberekî lêhatî û zana wekî Dr. Qasimlo di şiyana me de nine, lê wekî vebîranîn û baskirinê, çav li hinek wan xalên wê peyamê dikin ku dubare bînin bi bîra me ku rêniwîniyên niha û paşerojê bin.

Yek ji girîngirtîn kiryar û reftarên Dr. Qaismlo digel xelkê rik û zelal bû û di hemû xelekan de, çi li serkevtin û çi li şikest û çi li dema asayî de, rû li xelkê xwe dikir û bi zelalî û bi eşkere digel wan



diaxivt.

Siyaset û têkoşîn cem Dr. Qasimlo bi nehînîkirin û veşartina heqîqetan ji xelkê ku wisa xuya ye ku ew xelka ji vê bingeha kûr a siyasetê tiştekê nizanin, nebû!

Çi li destpêka ragihandina xebata eşkere de û çi li beşên din yên weke veqetiyana kongreya çar û piştire li her derfetek û rewşekê de ku xebat û şoreş hebû, Dr. Qasimlo dihat cem xelkê yaku li gorê de bû, bi zelalî û eşkere ji xelkê re digot. Her di vê rojê de jî, li 11`ê Reşemeya sala 1357`an a Rojî de, di vê mîtîngê de, Dr. Qasimlo, bas ji heqîqetên ser erdê kir û xelkê digot ger şoreş serkevtiye, ew bi çi wateyekê ye ku li Kurdistanê binkeyên jandarmirî mane, çi wateyekê digihîne!

Xaleke girîng a peyama 11`ê Reşemeyê, tevî gotina heqîqet û zelaliyên Dr. Qasimlo digel xelkê de, hêviyên bê sûd ji xelkê re nedan û ji aliyeke din ve jî reş nekirina tev tişt û bê hêvî nekirina xelkê bû. Bi vê wateyê ku hem ji xelkê re heqîqet bas dikir da ku xelk weke emanetdar û kesên cihê baweriya rêberê şoreşger, heqîqetan bizanin û hem hêviyên vala nedan û tev cîhan jî wisa tarî û şêlû ne dikir ku xelk ji tev tiştan bê hêvî bin.

Rastbêj bûn û hêviyên vala nedan û herwisa bê hêvî nekirin û zal nekirina reşbîniyê, ji wan taybetmendiyên rêberekî karîzima û piragmatîk yên wekî Dr. Qasimlo bûn ku wisa ji navbirî kir ku xelk bo hertmî digel rêberê xwe bin û niha piştî derbasbûna zêdetir li 32 salan li ser şehîdbûna Dr. Qasimlo de, xelkê li Şoreşa Jînayê de hawar dikirin ku Qasimlo rêya de berdewam e.

Di peyama 11`ê Reşemeyê de, Dr. Qasimlo li derheq mafê Kurd de diaxive û dibêje, em wekî Kurd digel birayên xwe yên Faris, Tirk, Belûç, Tirkemen, Ereb, Ermenî, Asorî û … hwd, bihevre me şoreş birêve biriye û di serkevtinê de jî dibe em mafê xwe bidest bixin.

Rêk sê hefteyan piştî nemana rejîma paşayetiyê, Dr. Qasimlo bas ji metirsiyekê dike, bas ji gefekê li ser mafê Kurdan dike ku renge mirovên amade di vê mîtîngê de, ecêbe be ku ji nû ve rejîma paşayetiyê hilweşiya ye û êdî çi metirsiyek heye? Lê, Dr. Qasimlo hem metirsiyê fêm dike û hem digel xelkê bas dike û hem rêçare heye.

Ew metirsiya ku Dr. Qasdimlo bas jê dike:

“Tawanbarkirina gelê Kurd bi cudahîxwaziyê, straneke kevin e! Her dema ku gelê Kurd daxwaza mafên xwe kiriye, ew Tawana xistine stûyê wê.

“Di demekê de ku em vê tawanê bi pîlana dujmanên şoreşê dizanin û bi tewahî vê red dikin û radigihînin ku li seranserê Kurdistanê de ti hêzek daxwaza cuda bûnê

»»»Dom R:4

»»»Doma R:3

nake, Kurd daxwaza mafê netewey yê xwe di çarçêveya Îranê de dike. Ger dujminên şoreşa Îranê û gelê Kurd, wisa dizanin ku tawanbarkirina gelê Kurd bi cudahîxwaziyê, wisa ji Kurdan dikin ku rewşa berevanîkirinê bigirin ber xwe û daxwaza mafên xwe neke û ev yek şaştiye!

Dr. Qasimlo bas ji straneke kevin dike! Ku li serdema Paşayetiya Pehlewî de hatiye dirust kirin û destkirda dezgeha dije mirovî ya Sawakê ye û tohmeta cudahîxwaziyê li Kurd didin! Ev tohmeta her wekî Dr. Qasimlo dibêje, bo vê ku sîstema dîktatoriya xwe berdewam bikin û li ser navê dijayetîkirina cudahîxwaziyê, dixwazin serkutkirinê li Kurdistanê bidomînin û Kurd ji mafên wê bê par bikin û li ser navê şerê Kurdistanê azadiyên xelkê di parçên din yên Îranê de jî bin pê bikin.

Rejîmek ku nexwaze mafê xelkê bide, li pey peydakirina hincetê ye ku, mafê vê bin pê bike û pişt guh bixe. Rejîma ser hişk û çewtekar û mirovên faşîst û dije mafên gel, bi zelalî bas ji vê nakin ku em mafê we yê han nadin, belku tohmetekê li ser de didin sepandin ku esas û mafê vê ji rê derbixin û diyalogê bikin bi diyalogeke piçûk û di dawiyê de jî dest bidin bi çekê bo serkutkirinê! Ew pîlana kevin her wekî Dr. Qasimlo dibêje, straneke kevin e, sedan û hezaran carî dubare dibe da ku wisa ji Kurd bikin da ku neteweyên din ku bas ji rewatiya xwe nekin û ger tiştek hûr jî bas bikin, gelek bi şermîn bas bikin. Her ji ber vê yekê ye ku Dr. Qasimlo dibêje: Neteweya Kurd mafê wê bixwe ye ku bi zelalî jêra bê gotin ku êdî zilma netewatiyê li ser namîne. Dibêje ku bi zelalî radigihînin ku em bo dabînkirina mafên destnîşan kirî yê çarenivîsa neteweya xwe xebatê dikin.

Her di vê peyamê de û piştî vê ku bas ji mafên netewatiyê yê Kurd û rêçareya vê ku wî demî bi xwedmuxtarî dizane bas dike, ji rejîma nû re dibêje ku nabe artêş û jandarmirî weke berê bo serkutkirinê bikar bîne û îdareyên Kurdistanê bi destê xelkê Kurdistanê bin û gelek rêyên din bas dike û bitaybet bas ji xaleke girîng dike ku dibêje heman rêçareya rejîma berê negirin berahîka xwe! Ew jî wiha ye ku xelk li hember hevdu bên tûj kirin!

Dibêje ku: Nabe rê bidin dujmin di navbera me de nifûz bike û aloziyan çê bike! Nabe ti tex û qadeke nîştimanê û ti eşîrek li dijî eşîreke din û ti hêzeke siyasî li dijî hêza siyasî ya din bê tûjkirin!
Her ewane parek in ji wan taktîkan ku dujmin hertim li dijî Kurd û Kurdistanê bi kar aniye û her ji ber vê yekê ye jî wî demî Dr. Qasimlo bi eşkere bas dike û dibêje ku ew rêyên kevin nedin berahîka xwe!

Peyama 11ê Reşemeyê, her çawan ku Dr. Qasimlo bas kiriye, manîfesta xebat û mafên neteweyî yê Kurd û Hizba Demokrat e û niha jî piştî derbasbûna 44 salan her nû maye. Çimkî hem Dr. Qasimlo rêberekî karîzimatîk û kêrhatî bû ku bi hûrî û bi dirustî bas ji êş û dermanên wê dikir û hem jî niha dujminên Kurd heman rêçareyên berê didin berahîka xwe û hişmendiya me li derheq pîlanên wan û herwisa rêkbûn û sorbûna me li ser mafên neteweya xwe hewce ye.

## Heyeteke Hizba Demokrat di salvegera koça dawî ya "Mela Mistefa Barzanî" de beşdarî kir





Heyeteke Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ji Kanada û Amerîkayê, li salvegera koça dawiya "Mela Mistefa Barzanî" beşdarî kir.

Roja Şemî 13ê Reşema sala 1401an a Rojî, heyeteke Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ji Kanada û Amerîkayê li ser gazîkirina taya 7 a Partiya Demokrat a Kurdistanê, di 44emîn salvegera koça dawiya "Mela Mistefa Barzanî" de beşdarî kir; Heyeta Hizba Demokrat a Kurdsitana Îranê ji aliyê berpirsê taya Partiyê li Amerîka û Kanadayê "Hikmet Bamernî" ve bi germî hate pêşewazîkirin.

Rêûresm bi sirûda netewî ya "Ey Reqîb" û ragirtina xulekek bê dengî ji bo canê paqij ê şehîdên doza rizgariya Kurd û Kurdistanê hate destpêkirin.
Piştre belge fîlmek li derheq jiyan û xebata nemir "Mela Mistefa", bo beşdarbûyên rêûresmê hate pêşkêşkirin.

Di berdewamiya rêûresmê de çend kesan li derheq rola "Mela Mistefa Barzanî" li tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd û beşdariya "Barzaniyan" bi rêberiya "Mela Mistefa" li Komara Kurdistanê, çend gotinek pêşkêş kirin.

## Li peravên Lîbyayê 17 koçber xeniqîn û ranî ji Kobaniyê ne



Belemeke koçberan li peravên Lîbiya binav bû, 17 koçberan canê xwe ji dest dan, piraniya wan ji bajarê Kobanî yê Rojavayê Kurdistanê ne.

Ciwanekî ji Kobanî ku li Lîbiya dimîne ji Rûdawê re got, duh belemeke koçberan ji navçeya Kembût li bajarê Tibriq li Lîbya dixwest biçe Îtalya, li nêzîkî peravên Lîbiya binav bû, di encam de 10 koçberên ji Kobanî ku 6 ji wan ji malbatekê bûn, 3 Jinên ji Efrînê û 3 koçberên ji Bengiladiş û kesek ji Misrê canê xwe ji dest dane.

Wî ciwanê ji Kobanî ku li Lîbiya dimîne got, tenê cihê 12-15 kesan di belemê de hebû, lê 25-30 kes lê siwar bûn, dixwestin bi wê belama biçûk ji bo belemeke din a mezintir bên veguhestin, ku li nava Deryaya Spî li hêviya koçberan rawestiya bû, lê belema biçûk ji ber giraniya barê wê ketibû bin avê.

Li gorî zanyariyan 7 kes hatine rizgarkirin, dibe ku hejmara qurbaniyan zêdetir bibe, ji ber ku hîn hejmareke kes wenda ne.

Cotmeha sala borî jî belemeke koçberan li nêzîkî bajarê Wehran yê Cezayirê ketibû bin avê, 18 kesan têde canê xwe ji dest dabûn, piraniya wan xelkê Kobanî bûn.

# Şine Dirûdger: “Wate 8`ê Adarê di hejmaran de tenê rojek e, lê di hundrî xwe de hilgirê wateyeke kûr e ku dîroka dijwar a xebat li dijî tepeseriyê li pişt de ye.”



## Şine Dirûdger

**Me digel rêzdar Şine Drûdger li derheq salroja cîhanî ya Jinê yanî 8`ê Adarê hevpeyvîn pêk anî û navbirî di vê barê de got: “Wate 8`ê Adarê di hejmaran de tenê rojek e, lê di hundrî xwe de hilgirê wateyeke kûr e ku dîroka dijwar a xebat li dijî tepeseriyê li pişt de ye.**
**”**

**Hevpeyvîn : Hesen Mukerem**

**P: Roja 8`ê Adarê weke Roja Cîhanî ya Jinê hatiye destnîşan kirin li gor we civaka kilasîk a Kurd di vê serdemê de heta çiqas bandora nerînî li ser jina Kurd hebûye?**

**B**: 8`ê Adarê rojeke ku bûye remiza xebata jinê bo nehêlana cudahiyên zayendî. Rêzgirtin li 8`ê Adarê, rêzgirtin li xebata zêdetir a du sedsalên jinane bo nehêlana tepeseriya ku bi sebeba sîstema bavkisalariyê bi ser wê de hatiye sepandin e.
Diyar e xebata jinan hewcehî bi 8`ê Adarê nine, belkû 8`ê Adarê bûye remiza xebata jinê li dijî tepeseriyê.
Wate 8`ê Adarê di hejmaran de tenê rojek e, lê di hundrî xwe de hilgirê wateyeke kûr e ku dîroka dijwar a xebat li dijî tepeseriyê li pişt de ye.
Li destpêkê de xebata jinê bo bidestveanîna mafên xwe, wedigire bo destpêka sedsalên 20`î û wê tevgerê li welatê Amerîkayê destpê kir û piştire seranserê Ewropayê girt berahîka xwe û li hundr de jinê pêngavên gelek micid bona bidestveanîna komek maf û li hemû waran de ku berê ji wan hatibûn qedexekirin.
Di heyama wan salên dawiyê de jî, tevî vê ku welatên Ewropî, li welatên cîhana sêyem jî, jin û zilamên azadîxwaz, bi mebesta wekhevîxwaziya zayendî û dawî anîn bi cudahiyan, xebatên cuda lidar xistin û ev yeka bi zelalî li ezmûnên Herêma Kurdistanê de nîşan dide û îhsas pê tê kirin. Herwisa li Rojhilatê Kurdistanê jî, tevî desthilata dîktator û mirovkuj a Axûndî, dibînin ku jin û zilam bi hevre hewl didin ji bo bidestveanîna lêhatî, wekhevî û îdaleta civakî xebat dikin.

**P: Şine xan di vê serdemê de hûn rola jinê li civak û bitaybet li civaka Kurd de çawan dibînin?**

**B:** Jinên civaka Îranê bitaybet Kurdistana Rojhilat, di heyama wan salên dawiyê de bi şêweke mandînenas xebat û têkoşîneke berfireh bo paşekêşîkirin bi rejîma Komara Îslamî û yasayên paşvero ku li ser bingeha çendîn cure cudahîdanîn û yek ji wan jî, zilm û cudahîdanîna zayendî ya li dijî jinan hatiye avakirin birêve birine. Ev sîstema siyasî ya paşvero ku niha weke ruhekê siya xwe daye bi ser welatê me de, û hem mîratgira komek edet û nerîta zilamsalariyê ku xwe li dijî dixwazên rewa yên jinên wekhevxwaz bikar tîne û hem bixwe berhemhênerê kultûr û hişmendiyeke îdolojîke ku jin di vê kultûrê de xwediyê ti mafek û hilgirê ti nirxeke mirovî nine û tenê weke amûr û êxsîrekê bo xizmetkirin bi zilam û dezgeha berhemanîna heşîmeteke guhgir û perwerdekirina serbazan bo berdewamî û mana sîstemê temaşeyî wê dike.

Her ji ber vê yekê ye ku, jina Kurd bi hebûna vê hişmendî û rewşenbîriyê li derheq dezgeha desthilata rejîmê de, şiyaye hertim di rêzên herî pêş yên xebatê de cih bigire. Û di her nerizayetî û xwenîşandanekê de bibe pêşeng ku li Îranê rû didin.

**P: Şine xan rola niha ya jinê li şoreşê de digel serdemên berê ti guherînkariyek bi ser de hatiye? Û ger hatiye çawane?**

**B:** Ger em bas ji rola jinê berî avakirina Kurdisatnê bikin, dibînin ku civaka Kurdistanê civakeke gelêrî û bi tevahî zilamsalarî bûye û jinê tenê xwe di çarçêveya maldarî û xwedîkirina zarokan de dîtiye û ti nasyariyek li derheq mafê destpêkî yên xwe de tunebûye, her ji ber vê yekê ye ku pêka hewcehiya vê serdema civakê, saziyên taybet bi jinan hatine avakirin. Û vê yeka jî wisa kir ku jin di vê çarçêveya daxistî ya malê de derbikevin û xwe di nav civakê de bibînin û bi şêwekê bilî li male bûnê, li derve jî alîkar û piştevanê hevjînên xwe bin. Xuya ye jina Kurd di vê rewşê de nesekiniye û hewla xwe daye, di vî serdemî de, ku ji sedî 99 jin nexwandevan bûn, piştevan bin û hewla xwandin û hînbûna bi pîtên Af û Bê û nivîsînê bidin û beraxwe bidin bi nexweşaxaneyan û karê perestariyê(doşîze) bixebitin û heta weke mamosta dersê bêjin û rol bilîsin.

Lê, di serdema niha de ku serdema pêşkevtinê ye, bi kêfxweşiyê ve rewşenberî û têgihîştina jinê bilind bûye, nek tenê bo mijara mafê wekhevîxwaziyê xebatê dikin, heta mil bi milê zilaman bo bidest xsitina hebûna mafên neteweyî xebat dikin. Me dîtiye ku li dema xwenîşandanan de çi li bajaran de beşdar û pêşeng bûn û di vê pêxemê de qurbanî jî dane û çi jî weke pêşmerge li nav refên partiyan de çek avêtine milê xwe.

**P: Li Rojhilatê Kurdistanê, Şoreşa Jînayê bi şoreşa jinê hatiye naskirin û destpê kir bi nerîna we çima rejîma Îranê heta niha ew yeka qebûl nekiriye ku ew şoreşa jinê ye û naxwaze girîngiyê bide bi jinê?**

**B:** Rejîma Îranê her di destpêka hatina ser kar de, bixwe, weke welatiya hejamra du temaşeyî jinê kiriye û li gor wê jin lawaz e û nikare di jiyan û civakê de biryara drust bistîne.

Û her ji ber vê yekê ye ku di yasayên xwe de nek maf nedaye jinê, belkû bi awayek berdewam jî jin tepeser kiriye û dest bi ser mafên însanî yên wê de girtiye.
Dema ku wisa ye gelek normal e ku, di vê Şoreşa Jînayê de bas ji Şoreşa Jinê neke, çimkî ew baş dizane, ku jin di vê şoreşê de pêşeng in û di vê pêxemê de qurbanî jî dane.

**P: Şine xan bi nerîna we rewşa niha ya civaka me dibe ku jin guherînkariyekê bi ser dîtingeha xwe bîne li derheq zilam de an zilam dibe guherînkariyê di xwe de pêk bîne?**

**B:** Bi baweriya min, jin û zilam bihevre tevaker hevdun e û bihevre dikarin civakek wekhev û saxlem avedan bikin. Her ji ber vê yekê ye ku tev taktîkên civakê bi her du zayendan ve hewl bidin bo vê mijarê û ji bo vê xebat bikin. Lê, hem bi baweriya min û hem jî weke armanca Saziya Jinan, di vê qonaxê de serekîtirîn û bingehîtirîn armancên me xebat bo bidestveanîn û maf û daxwazkarina mafan di hemû waran de û hevdem bidestxistina wekheviya dadperwerane ye li rêya dabînkirina mafê bingehîn û însanî bo tev taken civakê û bitaybet jinan bo geşedan û beşdarîkirina wan di civakê de ye.

Herwisa xebat bo pirsa neteweyî bi xebateke mil bi mil digel pirsa jinan ya xwe dihesbîne û her ji ber vê yekê ye ku armancên serekî yên vê , li gor vê çareseriya pirsa neteweyî û hebûna nasnameya netewey ye û nebûna bidestiya neteweyî, rêxweşkere bo xebata jinan.

# Kawe Ahengerî: “Arîşeya sereke ya navbirî hizr û berfirehiya hizrî ya wî ye.”



Kawe Ahengerî
Çalakvanê siyasî

**Me digel rêzdar Kawe Ahengerî çalakvanê siyasî li derheq arîşeyên di navbera Riza Pehlewî û neteweyên xery fars de hevpeyvîn pêk anî û navbirî got Kawe Ahengerî: “Arîşeya sereke ya navbirî hizr û berfirehiya hizrî ya wî ye.”**

**Hevpeyvîn : Hesen Mukerem**

**P: Rêzdar Kawe çima Riza Pehlewî nekarî digel Şêwreya ku di hizra wî de ye heta niha pêk bîne û pirsgirêk çi ne?**

**B:** Di heqîqetê de cudahîbûna li Îranê, rengdaneveyek li opozisyonê de hebûye û bi wateyek din opozisyoneke pir reng jî heye. Ew opozisyona cuda heta niha ji hev du dûr û ne teba bûne, û lewma pêkanîna nêzîkatî û rêkevtin û hevbendî di navbera opozisyoneke wiha de kareke hêsan nine. Sebebek din wedigere bi şiyan, lêzanîn, taybetmendiyên hizrî û siyasî yên Riza Pehlewî bixwe ku, dikarim wekî aliyê nerînî bas jê bikin.

Ji bîra me neçe ku Riza Pehlewî heta niha nekariye di nav paşaxawazan de jî eniyek bêmînak û yekgirtî pêk bîne, çi bigihîje bi opozisyona pir reng. Di vê navberê de jî Hizb û aliyên yên siyasî xwedî reh û xwedî dîroka cemawerî ya weke Hizba Demokrat ku ne tenê nabe û nabe jî bikeve şûna Riza Pehlewî, û heta bigihîje bi navbirî ku dibe bi liberçavgirtina statûya siyasî û rêkxistinî ya partiyên Kurdistanê, bi awayeke lêhatî digel vê mijarê danûstandinê bikin.

**P: Rêzdar Kawe, bi nerîna we çima dibe Riza Pehlewî helwesteke wiha tund û dûr li lojîk û an bêjên popolîsîtî li hember Hizba Demokrat de bigire berahîka xwe?**

**B:** Arîşeya sereke ya navbirî hizr û berfirehiya hizrî ya wî ye. Navendgerayan bi giştî ji wan re dijwar e ku parvekirina desthilatê qebûl bikin û faktorên siyasî yên din yên weke Hizba Demokrat weke şirîkê hevpar yên xwe û wekî hev hesab bikin. Lewma dibînin ev şoreşa piştî kuştina keçeka Kurd û bi rêveberiya Hizbên Kurdistana Rojhilatê Îranê dest pê kiriye, ji bo wan giran e ku rêveberiya siyasî ya Hizbên Kurdistana Îranê bi giştî û Hizba Demorkat bi taybetî qebûl bikin. Sebebeke din jî wedigere ser cemawera wan kesayetiyên ku di heqîqetê de nek her Riza Pehlewî belku bi giştî di asta zanyariyên siyasî de jî nizim e. Her ji ber vê ye ku di nav welatekê de ku azadî tunebûye, demokrasî nebûye, azadiya gotinê nebûye, hizbayetî û xebata rêkxistinî bi şêweya yasayî û azadane nebûye, herwisa zanyariyên durst û guherîna hizr û diyalogê nebûye, popolîzim geşe dike û bazara vê xweş dibe. Ji ber vê ye bo Riza Pehlewî rihetir û bi zimaneke popolîstî mi`amile digel mijaran bike heta yên bigehîn.

**P: Rêzdar Kawe, bi baweriya we Hizba Demokrat dibe çi siyasetekê bo derbasbûn ji Komara Îslamiya Îranê û azadiya Kurdistan û Îranê bide berahîka xwe?**

**B:** Bigiştî Kurd û Hizba Demokrat jî bitaybet tenê yek rê li pêşiya wan e, ev jî berdewam bûn di xebat û têkoşînê de ye. Her ji ber vê yekê ye ger têda here an ji navçû jî, weke rewşekê bên hesab kirin û bêguman bijardeya Hizba Demorkat nine û nebûye, dema ku wisa ye dimîne xebat û berxwedanî. Wirda xebat girîngiyeke zêdetir peyda dike û HDKÎ dibe bi liberçavgirtina şêwaza xebata nû û karzan û bi mifahwergirtin li hêza neteweyên bindest, û herwisa pêkanîna hevbendiyê di navbera komarîxwazên bawermend û bi wekhevî û sîstemeke ne navengera, bi mebesta rûbirûbûna li hember Komara Îslamî, hêzê kom bike. Emê Kurd bi tena serê xwe Komara Îslamî bi me nayê herifandin, lê bi hêzeke bandordar di asta Îranê de bo herifandina Komar Îslamî. Her ji ber vê yekê ye bihêztirkirina hevbendiya xwe û pêkanîna eniyeke seranserî weke alitrinatîvê erka sereke ya HDKÎ ye di vê rewşa han ya hestyar de.

**P: Gelo çima di rewşa niha ya Îranê de seltenetxwaz ku rewşa xebat û alîkarîkirina li dijî rejîma Îslamiya Îranê, neteweyên xeryî faris înkar dike?**

**B:** Herçawan ku min li jorê jî qala vê yekê kir, hem wedigere bo kultûra siyasî û hem jî lawaziya neteweyên xery Faris di çawaniya mi`amilekirin digel navendgerayan. Û ji ber vê ye ku ev rewşa han ya niha berhema balansa hêz û kultûra siyasî û lawaziya me bixwe ye.

**P: Rêzdar Kawe, bi nerîna we çima dibe Hizba Demokrat li hember gotinên Pehlewî de helwestekee wiha bigire û bi zelalî rabigihîne ku digel Pehlewî alîkariyê nake?**


**B:** Bi baweriya min çend sedemên sereke hene:
Yekem, tepeserî û zilma dîrokî ya navendê li Kurdistan û Kurd di tev aliyan de. Kurdistan ciheke ku bi sebeba vê zilm û cudahiyê û piçûnkirina dîrokî kevtiye xebateke berdewam û rizgarîxwazane de ku ev jî bûye sedema pêkhatin û cihgirîbûna kultûr, bawerî û rêbazeke siyasî ku hizra rêniwîniya kesayetiyên siyasî bi giştî û hizbên Kurdistanî bitaybet.

Ya duyem evya ye ku Hizba Demokrat xîm û bingeha dustbûna îdareya Kurdistan û dabînkirina mafê neteweyetî ya neteweya Kurd e. ji aliyekî din ve jî organa herî serwe ya Hizba Demokrat kongre ye ku wirda siyaseta giştî û bingehîn a pêdaçûnê bo hildikeve, an tê pesend kirin. Her ji ber vê ye ku heta vê demê siyaseta pesendkirî ya Hizba Demokrat guherînkarî bi ser de nehatiye û kesê yekem yê Hizba Demorkat jî perewî ji vê siyasetê dike.Ya sêyem, Riza Pehlewî digel siyaseta fermî ya Hizba Demokrat gelek rêk nine û ji ber vê ye jî di heyama çend mehên derbasbûyî de, me çend caran dît ku kêmasî û heta curek bêrêzîkirin bi statûya neteweyên xery Faris di gotinên xwe de bas dikir û bi awayekî kêrnehatî diaxivt.
Ya çarem, şiyan û hişmendiya siyasî û neteweyî ya nifşa nû dibe ku bi awayekê bibiryar û bi mifah wergirtin li amûr û rêçareyên nû û gelek pirfeşinal di xebat û têkoşanê de be. Lewma ez li ser vê baweriyê me ku helwesteke wiha zelal vegotineke durst di rewşa niha ya me de ye.

**P: Hizba Demokrat berî vê ku bas ji Demokrasî bo Îranê bike ji aliyê Kurdan ve pir hat rexnekirin, bi nerîna we Hizba Demokrat dibe tenê bo Kurdistanê hewl bide an bo tev Îranê?**


**B:** Ev rexneyên han min pê durst û cihê xwe de nine, ji ber vê ku herçawan min li jorê jî qala vê kir, Hizba Demokrat û heta Kurd jî bigiştî nikare bi tena serê xwe rejîmê biherifîne da ku ev rejîma jî li desthilatê de be, Kurd bindest e û ev jî tenê xebata Demokratê nine. Lewma, dibe em di çend aliyan de hizr li jîngeha siyasiya xwe bikin û tev rehendên azadkirina Kurdistan û paşeroja Kurd li berçavbigirin. Tekezîkirin li ser Demokrasî bo Îranê ti li şe`in û giranî û rewatiya pekêca mafê Kurdan kêm nake. Ji aliyek din ve jî hebûna gelên nasyar li derheq demokrasî û demokratê de, garantî û ewlehiya siyasî ya me Kurdan jî pir bilind dike.Dema ku wisa ye nek bi vî awayî emê Îranê bixin pêş Kurdistanê belkû Demokrasî bo Îranê weke stratîjiyeke demdirêj û jîrane temaşe bikin ku bi qezenca Kurd e û bo ewlehiya statûya Kurd bi mifah e. lewma pir normal e ku wêrekiya tekezîkirin li ser mafê netewatiya me bas ji demokrasî bo Îranê jî bikin.

## Nerîna Lîderan




**"Raphael Grossi:"**

Em dixwazin valahiya agahdariyê bi dawî bikin da ku em perçeyên puzzlê dîsa li hev bikin



**"Schultz":**

Pûtîn di piştgiriya Ukraynayê de yekîtiya Rojava kêm nirxand.



**"Mihemed Îhsan:"**

Eger pirsa Kurd li çar parçeyên Kurdistanê çareser nebe, rewşeke ewle ava nabe'




**"Lloyd Austin":**

Bakhmut ya li rojhilata Ukrayna ji girîngîya operasyonê zêdetir sembolîk e.

# Mafê çarenivîsê!



**N: Elî Bidaxî**

Hejmara welatên endamên Neteweyên Yekbûyî di sala 1945'an de ji 51'an gihîştiye 149'an û ji sala 1980'î ve bûye 206, ku 196 ji wan endamên Neteweyên Yekbûyî ne. Sedema bingehîn a van guhertinan prensîba mafê çarenivîsê ye ku di heyama kêmtir ji 80 salan de zêdetir ji 150 gel û neteweyan bûne xwediyê pêkhateyên siyasî yên serbixwe û çarenivîsa xwe diyar dikin.

Mafê diyarkirina çarenivîsê weke mafekî mirovî, bingeha mafên din ên mirovî ye û ji ber vê yekê hemû kes û komên civakî bêyî cudahiya etnîsîte, nijad û olî dikarin kar û barên xwe di warê siyasî, civakî, aborî û çandî de bigrin destê xwe. Lewma peymana Neteweyên Yekbûyî basa mafê çarenivîsê û pêwîstiya rêzgirtin li maf û azadiyên bingehîn û xwezayî dike, û ev mijar di nav prensîbên bingehîn ên mafên navnetewî de ye ku ji bilî binpêkirina serweriya netewî, berî her tiştî dikare were parastin û bikaranîn.

Divê pêşî li binpêkirina mafên kêmneteweyan di nav her civakê de bê girtin.

Bi gotineke din, mafê çarenivîsê ji bo her neteweyekê ku sîstêma xwe ya siyasî, aborî û civakî hebe û statûyeke navnetewî bi dest bixîne, mafekî nenas e. Paşê, bi qebûlkirina belgeyên din ên navnetewî re, ev maf bi tevahî nehat naskirin û mikurkirin, lê bicihanîna wê li ser milê dewletan hat danîn.

Mafê çarenivîsê bi têgehên wekî dêmokrasî, azadî û mafên mirovan ve girêdayî ye, yek ji sedemên girîngiya vê prensîbê ji bo pirsgirêka dêmokrasî, azadî û mafên mirovan ew e ku nebûna dêmokrasiyê li her welatekî dibe sedema binpêkirinên mafên mirovan.

Îranê di sed salên borî de her cure binpêkirina li dijî neteweyên li wir rewa kiriye.

Ev rewş bûye sedem ku netewe - bi taybetî kurd - daxwaza mafên xwe bikin û jê re xebatê biki , lê eger her du hêzên navendîparêz ên padîşahiya Pehlewî û rêjîma Îslamî, rêjîmên dêmokratîk bin û rêzê li mafê çarenivîsê bigirin, wek mafekî bingehîn ê mirovî ji bo beşdariya siyasî bide neteweyan û mafên wekhev bê cudahî bêne dayîn; Ne dê ciyawaziya di navbera hêz û neteweyan de ewqas mezin bûya û ne jî dê pêvajoya dêmokratîkbûna welat ewqas dirêj bûya.

Di sedsala borî de, rêjîmên navendî li Tehranê hertim "yekparebûna axê" daniye pêşiya prensîbên mafên mirovan.

Di çend mehên derbasbûyî de, ku şoreşa Jîna şûna xeyala komplo, zihniyeta şovenîst, baweriyên nedêmokratîk û siyasetên dijî mafên mirovan ên Komara Îslamî bi manîfestoyeke bi temamî medenî û mafparêz veguherand, mijara "yekparçeyiya axê" bû.

Herwiha ji aliyê hejmarek hêz û tevgerên siyasî yên dijberên rêjîmê ve tê cesaretkirin û wê wek hêla sor binav dikin û wek hêncetek bo êrîş û gefan li dijî neteweyên mafxwaz ên weke Kurd li vî welatî tê binavkirin.

Pîrozkirina sînorekî ku di dîrokê de çendîn caran hatiye guhertin û kêmkirin û ji ber sedemên curbicur, gelek caran ji ber nezanî û lawaziya hikûmeta navendî, hertim bûye hêncet ji bo berdewamiya zext, komkujî, tundî û cudakariyê.

Bêyî ku bizane yekitiya xakê bi jiholêrakirina cudahiyan û binpêkirina mafên neteweyên bindest bi hêza neteweya serdest û bi giştî bi tevkujiyê nayê parastin.

Hevkêşe eşkere ye. Heya niha ti yek ji neteweyên Îranê daxwaza serxwebûnê nekiriye û partiyên sereke yên van neteweyan – wek mînak Kurd – dixwazin bi avakirina sîstêmeke fêderalî pirsgirêkên xwe yên netewî û mafên mirovan li Îranê çareser bikin.

Lê dema ku çanda neteweyekê di welatekî navendî de di bin metirsiya windabûnê de be û sîstêma siyasî rê nede ku ew beşdarî rêveberiya welat bibin û bibin xwediyê mafên xwe û xwe di şanoya siyasî û civakî de bibînin û dîroka xwe bidin wan di hemû beşan de marjînal bikin; wê demê ew rêjîm e ku hemû rewatiya xwe ji holê rakiriye.

Di encamê de jî mafê neteweya navbirî heye ku bi xwe biryara çarenivîsa xwe bide.

Ev biryar çi dibe bila bibe, divê bi fermî were naskirin û rêzgirtin, û eger bikaranîna mafan bi her şêweyî bibe sedema rewşeke cuda li welat, berpirsyariya rewşa nû dikeve ser milê hikûmetê û desthilatên navendê.

Ji ber vê yekê ti ax û erdnîgarî ji azadî, mafê jiyanê û rûmeta neteweyeke bêpar pîroztir nîn e.

Şoreşa Jînayê ya bi diruşma "Jin, Jiyan, Azadî" di dîroka Îranê de hem xaleke zivirînê ye û hem jî derfeteke zêrîn e ji navendparêzan re ji bo nûavakirina vî welatî, û çêtir e ku vê derfetê ji dest nedin.

# Serokerkanê Amerîka serdana bakurê rojhilatê Sûriyê dike



Serokerkanê Artêşa Amerîka Mark Milley serdana hêzên welatê xwe li Rojavayê Kurdistanê û bakurê rojhilatê Sûriyê dike.

Roja Şemiyê Serokerkanê Artêşa Amerîka Mark Milley bi awayekî nikaveyî serdana Sûriyê kir.

Li gor Reutersê, armanca serdanê, nirxandina oparasyonên leşkerî yên li dijî DAIŞê û tedbîrên parastina hêzên Amerîkî ji êrîşan e.

Niha dora 900 leşkerên Amerîkî bi bihaneya piştevaniya Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) û rêgirtina li dubare derketina DAIŞê, li Rojavayê Kurdistanê û bakurê rojhilatê Sûriyê ne.

# Li Dêrazorê di encama teqîna mayinekê de 5 kesan canê xwe ji dest dan




Di encama teqîna mayineke li başûrê rojavayê Dêrazorê de, 5 kesan canê xwe ji dest dan û zêdetirî 40 kesî jî birîndar bûn.

Ajansa "SANA" belav kir, li herêma Kebacib a başûrê rojavayê Dêrazorê mîneke ji paşmayên DAIŞê di kamyonekê de teqiya ku tê de komek kes hebûn û bi mebesta lêgerîna li kuvarka Kimê (truffle) hatibûn deverê.

Da zanîn jî, di encama teqînê de 5 welatiyên sivîl canê xwe ji dest dan û zêdetirî 40 kesên din jî birîndar bûn û ji bo nexweşxaneya El-Esed a Dêrazorê hatin veguhastin.

Di dema borî gelek caran bombe û mayînên ku ji aliyê DAIŞê ve li beyabana Sûriyê hatine çandin, di karkerên ku li kuvarka Kimê digerin de teqiyan û hejmarek kes bûne qurbanî.

Duşema borî jî li derdora bajarê Selamiyê yê li rojhilatê Hemayê di encama teqîna du mayînên ji paşmayên DAIŞê de, 10 kesên ku li kivarkên Kimê digeriyan canê xwe ji dest dabûn û 12 kesên din jî birîndar bûn.

# Qeter Derengmayîna Alîkariyên Erdheja Sûriyê Rexne Dike

Mîrê Qeterê roja Yekşemê got ku ew ji ber derengketina gihandina alîkariyan ji bo ziyandîtîyên erdheja meha borî li Sûriyê matmayî ye, û anî ziman ku şaş e alîkariyên mirovî ji bo mebestên siyasî werin bikaranîn, ev yek bi awayekî eşkere li ser hikûmeta Sûriyê ye.

Qeter di nav çend welatên herêmî de bû ku piştgirî daopozisyonê di şerê navxweyî yê Sûrîyê de û berê jî li dijî hewildanên hin welatan ji bo asayîkirina peywendîyên bi Şamê re axivî.


Mîr Şêx Temîm Bin Hemed El-Sanî, di vekirina konferansa welatên herî kêm pêşkeftî ya NY de li Dohayê axivî, tekezî li ser pêwîstiya alîkarîya Sûriyan "bê dudilî" kir û piştgiriya hewlên Tirkiyê bo rizgarkirina ji erdheja wêranker kir.

Li Tirkiyê hejmara miriyan gihîşt 45,000î û bi tevî Sûriyê jî hejmar gihîşt 51,000 mirî.

Li Sûriyê, herêma bakur-rojavayê ku ji aliyê serhildêran ve di şerê bi Serok Beşar el-Esed re tê kontrolkirin, herî zêde zirar dît.

Şêx Temîm got: "Ji ber ku ez ji derengketina gihandina alîkariyê ji bo van gelên (Sûrî) meraq dikim, ez tekez dikim ku bikaranîna karesateke mirovî ji bo armancên siyasî nayê qebûlkirin."

Neteweyên Yekbûyî bang li hemû aliyên Sûriyê kir, ji bo zêdekirina gihandina alîkariyê.



Dezgehên alîkariyê gazinan ji qedexeyên hikûmeta Şamê dikin ku ew dibêjin belavkirina alîkariyê tevlî siyasetê dibe. Ajansên alîkariyê yên din dibêjin serhildêrên tund rê li ber gihandina alîkariyê ji beşên Sûriyê yên di bin destê hikûmetê de girtine, ev jî hewldanan aloztir dike.

Qeter bi rêya Tirkiyê alîkariyê ji Sûriyê re peyda dike, di heman demê de welatên din ên Kendavê mîna Mîrgehên Ereb ên Yekbûyî rasterast alîkariyên mirovahî digihînin wî welatî.

Doha, wek Waşinton, dijberiya xwe li hember her pêngavek ber bi nûvekirin an asayîkirina peywendiyan bi Esed re eşkere kir, amaje bi hovîtiya hikûmeta wî di dema şer de û pêwîstiya dîtina pêşketinan ber bi çareseriyeke siyasî kir.

# Dibe em berevajî kar bikinMe  Bike.



N: Vênûs Fayîq
W: Hesen Mukerem

Niha ku em civaka Rojhilata Navîn û bitaybet civaka cîhanî temaşe dikin, gelek bi hêsanî têbîniyan li ser guherînkariyan didin, ji wan têbîniyan yên weke derkevtina jinê li malê, bo kar, bo xwandin, û herwisa li warê siyasî û çalakiyên hizbî û hikûmî û li gelek warên din de ku jin roleke xuya li hundr dilîse. Herwisa jin û keç li soşyalmedyayan de bi awayeke xuya çalak in, jinên diaxivin, jinên medyakar, rojnamevan, hunermend û çalakvanên civaka medenî hejimara wan li berê pir zêdetir e.

Heta jinên ku xwediyê şûxil û diyar li warê aborî de hebûna wan diyar e. Ev yeka bi wateya ber bi pêşveçûna pêgeh û pirsa jinê li civakê de heye, tekoşîn di pêngav havêtinê de bo maf û azadiyên xwe hene.

Lê, ji aliyeke din ve, digel zeqkirina hizra Olî ya tundrew, êrîşa berdewam a wergirana hizra eşîreyî li dijî jinan he ye, heta haletên dawî anîn bi jiyanê û kuştina jinê û destdirêjî û bêzarkirin û jinavbirina jinan bi hinceta şerefê, gelek ji berê zêdetir e.

Ev yeka bixwe hewcehî bi eniyekê ji eniya vê aliyê berfiretir heye, ji bo vê ku bê şirovekirin.

Lê, yaku wirda ez dikarim bi awayekî kurt bas bikim, vê bi eşkere qebûl bikim ku di wan civakên weke civaka me de, ti tiştek bi navê "jîrbûnê" nine, belkû hewl û êrîşkirin bo azad bûnê ye û yaku bi "Maf" jî binav kiriye maf nine, belku rûkê sexte û hûrdekariyên pir hûr in. Çimkî hîn "Azadî" û "Maf"ê tevaw nebûne û pir caran jî ji rê derkevtine.

Heta niha me bes zilam rexnekiriye ku jinê diçewsîne û hewla bê îradekirina jinê da ye û jin pişt guh xistiye û dewra wê tor kiriye û avêtiye pileyekê xwar ji xwe, û me



bangihêjî bo hişyarkirina jinan da ye.


Di halekê de li rastiyê de dibe em berevajî kar bikin, jinê rexne bikin û zilam hişyar bikin.

Werin em jinan rexne bikin ji ber ku di du rewşan de asê mane: Yan ew qas pasîf in û her tiştî qebûl dikin û nafikirin ku ti tiştek ji wê mexlûqê kêmtir ninie ku bi awayek sivik temaşeyî dike, bi awayek serhilidêrbûn wisa dizane ku hemî ev tişta ku bi navê "azadî" di nav de ye, serhildana bê tam de kom bûye. Helbet mebesta min ne ew e ku jin serî hilnede, lê divê herî kêm têgeha serhildana mirovatiyê fêm bike, Ax serîrakirin di nav tûkelê de nine, bi qasî ku serhildan di hundr û kûrahiya hiş de dest pê dike.

Hinek deman jinê hewcehî bi vê yekê ye ku zagonê bin pê bike û li dijî zagonê rawest e, hewce dike em dibe zilam hişyar bikin da ku ji vê yekê fêm bike ku jin weke wî însan e, demaku bas ji wekheviyê dikin û daxwaz nakin, belku wan bidin fêmkirin ku em wekhev in û wekhevî tiştek nine ku ev bibexişe.

# Jineke girî li girtîgeha Sinê bi sedema nebûna xizmetguzariyan canê xwe ji dest da

Seyde Amîne Ehmedî girtiya li navenda "Kanûna Îslah û Terbiyet" ya rejîmê li Sinê, di demekê de ku rewaş tendirustiya wê nebaş bû û bo navendên pizîşkî dereng hate veguhestin, jiyana xwe ji dest da.



Roja Pêncşemî 11ê Reşemeyê, Seyîde Amîne Ehmedî, girtiya temen 47 sal a ragirtî li navenda "Kanûna Îslah û Terbiyet" a rejîmê li bajarê Sinê, ku rewaşa tendirustiya wê nebaş bû û di vê navenda hikûmî de dereng bo navendên pizîşkî hate veguhestin, jiyana xwe ji dest da.

Hengawê ragihandiye, ew jina bendkirî di van dawiyan de janesereke tund hebûye û ji ber nehiştina berpirsên girtîgehê ji bo navendên pizîşkî yên li derveyî girtîgehê, bi sedema êşa zêde celteya mêjiyê lê daye û canê xwe ji dest daye.

# Şîret û ezmûnên ku bo me dibin wane



N: Hesen Mukerem



Her netew an welatek ku bixwaze hevgirtî, bihêz û pêşkevtî be, dibe perwerdehiyeke drust û serast hebe û hertim divê piştigirê hev bin û hewceye ku destanrêsî, ezmûn û efsaneyên gelê xwe bizanin.

Bo mînak, çima Japon welateke pêşkevtiye, li sala 680an berî Zayînê O No Yasumaro yekem împratorê Japonê pirtûka bi navê Kujîkî nivîsî û di pirtûkê de behsa sedan destanrêsî, efsaneyên Japonyian, êş û azarên gelê Japonê kiriye, û herwisa behsa xwedawendan kiriye û ev pirtûk radestî împratorê cêhgirê xwe kiriye û kiriye yasaya ku dibe her hemû xelkê Jopanê pêka vê pirtûkê perwerdehiyê bibînin û peyrewî jê bikin, û niha jî Ola Şînotîzim ya Japonê peyrewiyê jê dikin û di pirtûkê de hatiye her kes pêka wan rêniwîniyan nexebite, xwedawend dê wî ceza bikin, ji ber ku di vê pirtûkê de çîrokên efsaneyî yên xwedawendan ya li dirustkirina Japonê û yekxistina hemû giravan li çarçêveya desthilatdariyê de hatiye tomarkirin û xwedawendan di vê pirtûkê de gengeşeyên xwe kirine ku xelkê Japonê fêrî gengeşyê bibin û her ji ber vê ye ku xelkê Japonê pişta hev ber nadin û hemû hewl û xebata xwe bi hev re bo pêşkevtina welat xistine ser hev.

Yan efsaneya Gilgamêş jî pir balkêşe, dema ku Înkîdo di nav destên Gilgamêş de dimire, Gilgamêş rû li xelkê dike û dibêje: Gelî pîrên Orokê guhdarê min bin, ji min bibihîzin! Ez li ser destê xwe Înkîdo digirîm, bi dilşewtiya jinên şînkêş digirîm, Înkîdo balteyê kêlega min bû û kevanê destê min bû, kêra ber pişta min bû, mertala li pêşiya min bû, cilên cejna min bû û şahiya min a tenê bû, heta ku dijmenekî qirêj ew ji min dizî.

Niha eger em dîroka netewеya xwe bişopînin, destanrêsî û efsaneyên leheng û mêrxasên gelê xwe yên weke, Simkoyê Şikak, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Ebdulrehman Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî dibînin û çawa û bi çi zanist û ezmûnekê karîne di serdemên xwe de li hember dujminên gelê Kurd de berxwedanê bikin û şîret û ezmûnên xwe bo me bi cih hêlane û em bi berçavgiritina gotin û şîretên wan dikarin ber bi gupika serkevtinê ve bimeşin.

Bavê nasyonalîzima Kurd, Simkoyê Şikak dibêje: Ey Kurdino ez bilî yekîtî û yekgirtinê çareyek din bo rizgarbûna neteweya me ji destê dujmanan de nabînin, jibilî destê hev du girtinê, çareyek din bo Kurdên bêçare tunye, destê biraytî û rastiyê bidin hevdu heta ku bihemû hêza xwe bi dijî destdirêjiyên dagîrkeran bisekinin, ji ber ku rêya azadî û serbestiyê her ewa ye.

Ji bo mînak, rêberê şehîd Pêşewa Qazî Mihemed yekem serkomarê Kurdistanê di beşek ji wesyetiya xwe de dibêje: Ji vê zêdetir dijminatiya hevdu nekin, yek bigirin û piştevanê hev bin, bê sûd xwe nefiroşin bi dujminan û zarokên xwe hînî zanistê bikin, çimkû wiha ew pêşkevtin e, û her neteweyeke hînî zanistê bibe li pêşkevtin û şaristaniyetê pare namîn e.

Bi hînbûna zanistê û yekgirtin û rêkxistinê mezintirîn çeke ku li dujmin dixî û îxanet ji hevdu nekin.

Şehîd Dr: Ebdulrehman Qasimlo jî dibêje: Em dibe li kêmiyê de dest pê bikin heta ku digihîjin bi armancan.

Yan şehîd Dr. Se`îd Şerefkendî dibêje: Keç û xortên Kurd bila baş bizanin ku jiyana di êxsîrî û bindestiyê de biser şorî û şermezarî, çiqas bêqedir û qîmet e û li hember hilmijêna hewayê paqij û bê toz de, serbilindî û azadî çiqas xweş û dilrevîn e.

Bona rizgarbûn ji bindestî û zordestiyê, ew şîretên rêber û mamosteyên şoreşê dibe bo me Kurdan di jiyana şoreşgerî de bibin bi ders û rênîşander.

Bi wan gotinan dixwazim bêjm ku neteweya me yanî Kurd jî mêrxas û lehengên xwe hene, ger em pêka rêniwînî an şîretên wan tevbigerin, an zarokên xwe perwerde bikin dibe ku hem zarok hem nifşa piştî me ji me serkevtîtir bin û bibin xwediyê Kurdistana azad û hertim pişta hev bin û yekgirtî bin, ne jî hinde îxanetkar di nav gelê Kurd de hebin.

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Daniyal Mihemedpûr yek ji birîndarên xwenîşandanên nerizayetiyên Mihabadê bo cara sêyem dê bê neştegerî kirin

"Daniyal Mihemedpûr" kurê Mihemedemîn û Hemîn û xelkê bajarê Mihabadê ku di mesa nerizayetiyên seranserî di wî bajarî de bi sebeba teqeya rasterast ya hêzên ewlehî û serkutker çavekî wî birîndar bibû, dê bo cara sêyem bê neştegerîkirin.

Pêka gotina çavkaniyeke haydar a "Kurdpa"yê, mezaxta neştegeriya wî nûciwanê temen 17 salî ya cara sêyem 35 milyon Tumen e.
Wê çavkaniya haydar zêde jî kiriye ku, ew nûciwanê Kurd du caran di navendên dermanî yên Tewrêz û Tehranê de hatiye neştegerîkirin, lê heta niha rohnahiya çavê wî yê aliyê çepê çê nebûye.

"Mihemedpûr" bo cara sêyem di navenda taybeta Pizîşkê Çav ya Nîkan a Tehranê de dê bê neştegerîkirin û li rêkevta 21`ê Befranbara sala 1401`an piştî kêmek sarêjbûnê mirexes kiribûn.

"Daniyal Mihemedpûr" jidayîk bûyê Rêbendana sala 1384`an li bajarê Mihabadê ye.

## Kolberekî Kurd bi sebeba teqeya hêzên leşkerî birîndar bû

Roja Şemî 13`ê Reşemeyê, kolberê Kurd yê bi navê "Ce`ifer Fathî" temen 24 salî û xelkê bajarê Sinê bi sebeba teqeya rasterast ya hêzên leşkerî yên hikûmetî li sînûrê Newsûdê birîndar bû.

Hêzên leşkerî bi bê haydarkirina berê gule berdane wî kolberî.

Ew kolberê Kurd bona çareseriyên pîzişkî bo nexweşxaneya Kewsera bajarê Sinê hatiye veguhastin.

"Ce`ifer Fathî" xêzandar e û xwediyê sê zarokan e.

## Biryara îdamkirina girtiyekî tawanbar bi "kuştina bizanebûn" li girtîgeha Seqizê birê ve çû

Serspêdya roja Yekşemî 14`ê Reşemeyê, biryara îdamkirina girtiyê bi navê "Kyomers Zerxamî" bi tawana kuştina dezigrtiya xwe ya bi navê "Gulale Şêxî" ji aliyê taya Yek ya Dadgeha Keyferî ya yek ya parêzgeha Sine bi "îdamê" hatibû cezakirin li girtîgeha Seqizê birê ve çû.

Roja 15`ê Befranbara sala 1400`an, navbirî ji aliyê taya Yek ya Dadgeha Keyferî ya Yek ya parêzgeha Sine bi tawana "kuştina bizanebûn" bi îdamê hatibû cezakirin.

Roja Sêşemî 18`ê Cozerdana sala 1400`an, termê şewtî ya "Gulale Şêxî" keça Osman û xelkê bajarê Seqizê ku ji aliyê dezigirtiyê xwe ve hatibû kuştin, li qeraxa rêya di navbera Seqiz bo Sine ya serweyî gundê "Çapana Serê" ji aliyê hêzên îtla`atê ve hatibû peydakirin.

"Kyomers" piştî binçavkirinê û di pêvajoya lêkolînê de li îdareya îtla`ata Seqizê de, îtraf kiribû ku sebeba sereke ya wî bona kuştina dezigirtiya xwe, çê bûn alozî li ser karkirina "Gulale"yê bûye.

"Kyomers Zerxamî" xelkê gundê "Şerîfava"yê ser bi bajarê Dîwandereyê û rûniştiyê bajarê Seqizê bû.

## Giritiyekî xelkê bajarê Herisînê li girtîgeha Navendî ya Hemedanê hat îdamkirin

Serspêdeya roja Çarşemî 10`ê Reşemeyê, biryara îdamkirina girtiyê Kurd yê bi navê, "Mihemed Dostînijad" yê temen 29 salî û xelkê bajarê Herisîna ser bi parêzgeha Kirmaşanê li girtîgeha Navendî ya Hemedanê birê ve çû.

Ew girtiyê Kurd berê bi tohmeta kirîn û firotina madeyên sirker hatibû binçavkirin û piştire ji aliyê Dezgeha Dadweriyê ve cezayê îdamkirinê bi ser de hatibû sepandin.

Heta niha nûçeya îdamkirina wî girtiyê Kurd, ji aliyê navend û medyayên navxwe yên Îranê ve nehatiye ragihandin.

Her di vê pêwendiyê de jî, serspêdeya roja Sêşemî 9`ê Reşemeyê, cezayê îdamkirina girtiyê Kurd yê bi navê "Kiyomers Sadiqpûr" yê xelkê bajarê Kirind Xerbê, bi tohmeta kirîn û firotina madeyên sirker cezaya îdamkirinê bi ser de hatibû sepandin û li girtîgeha Dîzelavaya Kirmaşanê birê ve çû.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (441)

